Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1032 18-Çile- 2022 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165


# Jinên azad dinyayê xweşiktir dikin

**Hunermenda Îranî Ghazal Ashrafian ji bo koleksiyona xwe ya bi navê “Jin, reng, dans û azadî” gelek wêneyên jinan çêkirine. Ew bi van wêneyên xwe dixwaze jinên azad û serbilind nîşan bide û dibêje, “Tevî jinên azad û bextewar dinya xweşiktir dibe.”**

Hunermenda Îranî Ghazal Ashrafian (Xezal Eşrefyan) a ku koçî Awusturyayê kiriye, ev qederê 25 salan e ku resman çêdike. Ew sala 1982’yan li Îranê hatiye dinyayê û sala 2015’an jî ji Îranê derketiye û berê xwe daye Awusturyayê. Piştî ku li Awusturyayê bi cih dibe li ser xem û xeyalên xwe bi riya rengên akrîlîk û boyaxa avî li ser tuwalan xêz dike. Ew bi resmên xwe ketiye pey azadiya jinan û di tabloyên xwe de zêdetir cih dide jinan, di tabloyên xwe de jinan bextewar nîşan dide û li ser têgehên bi vî rengî disekine. Xezal Eşrefiyan dide zanîn ku ew li welatê xwe Îranê, weke jinekê, ne tên xuyanê. Lê tevî vî jî, ew bi akrîlîk, boyaxa avî û pastelê resmên xwe çêdike. Ew bi van tabloyan li hêlekê jî Azadî, reng û dansa jinan nîşan dide û armanca xêzkirina xwe bi van gotinan derdibire, “Ji bo Îranê, ji bo azadiyê, ji bo jinan, ji bo xwe û ji bo we hemûyan. Heta azadî pêk were…”

**Dar û fêkî têra xwe hebûn!**

Gelek kesan ji Xezal Eşrefiyan re gotiye ku ji dêvla jinan dar û fêkiyan biresmîne û çi îşê wê bi vê meseleyê neketiye, lê ew bi israr li jinên welatê xwe vegeriyaye û ew xêz kirine. Wê jinên welatê xwe jî nirxandin û got; “Ji xwe dar û fêkî têra xwe hebûn! Lê ez niha ne li welatê xwe me, jinek im û dixwazim jinên welatê xwe nîşanî xelkê bidim. Ez di hemû resmên xwe de hinekî jî xwe dibînim. Jinên ku min ew di tabloyan de nîşan dane bextewar, azad û xweşik in. Her wiha cilûbergên ku min li wan



azad bûye û rewşa jinên li welatê xwe got; “Her tim êş û azar dibe para jinên welatê min û ez jî bi van êşan mezin bûm. Lê heya ji min hat min xwest ez bextewar bijîm. Ji lewre tevî jinên azad û bextewar dinya xweşiktir dibe.” Xezal Eşrefiyan di van rojên dawî de li bajarê Grazê yê Awusturyayê koleksiyona xwe ya bi navê “Jin, Evîn (reng û dans) û Azadî” di pêşangehekê de nîşanî xelkê da. Ji bo vê koleksiyona xwe temam bike, ew bi qasî sê salan xebitî û jinên welatê xwe resmandin.

**Heta azadî pêk were…**

Xezal Eşrefiyan bi saya fîgûrên di resmên xwe de sembolîzmê jî bi kar tîne û gelek fîgûrên ku meriv zû bi zû tê dernaxe ew çine di resmên wê de xuya ne. Yanî ew bi van tabloyên xwe, welatên jinên azad û serbilind nîşan dide û behsa welatê wan dike. Wê li ser hin tabloyên xwe jî peyvên hin stranan bi Farisî nivisîne û bi vî awayî hin tabloyên wê weke kolajan kirine jî rengîn in. Ev jinên welatê min ên rasteqîn in. Ew berxedêr in jî û dilê wan mişt azadî ye. Yanî dibe ku ew fizîkî ne azad bin, lê bi sekn û jiyana xwe li ber dilê min tim azad in.”

**Polîtîkayê li ser jinan ferz nekin**

Xezal Eşrefiyan ku niha li Ewrûpayê ye û ji rojhilat ber bi rojava ve koçber bûye, koleksiyona xwe bi vê dirûşmeyê çêkiriye, “Ji Rojhilatê dilê min ber bi Rojavayê dilê we ve pêkhatina fantaziyekê…” Wê pêşangeha xwe ya ku ji 30 resman pêk tê jî bi vê nihêrînê çêkiriye. Lê dema çêdike ew bi nihêrîneke oryantalîst nêzî meseleyê nabe, berevajî vê yekê dixwaze xeyalên jinan pêk bîne û wan azad nîşan bide, “Azadî ji bo gelek kesan belkî bi eynî maneyê tê nirxandin, lê ez jinên ku bi xwe bawer in û dizanin çi dibêjin pîroz dikim bi wêneyên xwe û li gel wan disekinim.
***Ozgurpolitika***

# Kişandina rêzefîlma ’Evîna Kurd’ bi dawî dibe

**Komîna Fîlman a Rojava kişandina rêzefîlma ‘Evîna Kurd’ bi dawî dike. Ev rêzefîlm piştî rêzefîlma ‘Tava Sor’ a duyemîn e.**

Rêzefîlma Evîna Kurd ji 15 xelekan pêk tê. Derhênerên rêzefîlmê Noman Gît û Haşim Aydemir in. Rêzefîlm balê dikişîne ser salên 2017 û 2018’an.
Nivîskarê senaryoya rêzefîlmê Akîn Ronî xwest vê peyamê bigihîne temaşevanan: “Şoreşa 19’ê Tîrmehê ne tenê ya guhertinên leşkerî ye, her wiha ya guhertinên fikrî, civakî, siyasî û pêşxistina rola jinan e jî. Nexasim ku çapemenî her tim hewl dide vê



şoreşê tenê wek şoreşeke leşkerî nîşan bide. Lê di rastiyê de armancên şoreşê guhertina bingehîn a civakê, pêşxistina azadiya jinan, parastina jîngehê û pêşxistina jiyana hevbeş a di navbera hemû pêkhateyan de ye.” Di rêzefîlmê de nêzî 20 karekterên



sereke hene û çîroka wê jî li ser malbatekê ye koka wê vedigere serdema Şêx Seîd (1925’an).
Endama Komîna Fîlman a Rojava Çiya Hicran Çîçek têkildarî rêzefîlmê wiha axivî: “Em êdî dikin kêşana rêzefîlma xwe bi dawî bikin. Bi rêya vê xebatê em dixwazin balê bikişînin ser gelek mijarên civakî yên piştî Şoreşa 19’ê Tîrmehê rû dane, saziyên ku hatine avakirin û şoreş li dar xistine çi ne? Şoreş ne tenê rizgarkirina axê ji aliyê leşkerî ve ye, lê belê di aliyê îdeolojî û çandî de ye. Me xwest balê bikişînin ser van mijaran ji ber ku şoreşa Rojava di aliyê leşkerî de li cîhanê deng vedaye.”
Çiya Hicran Çîçek wiha domand: “Her wiha em balê dikişînin ser şerê taybet û bandorên wî şerî ku dijmin li dijî gel dimeşîne.”
Hicran Çîçek destnîşan kir ku evîna Kurd ne tenê ya di navbera keçek û xortekî de ye, her wiha ew evîna welêt û xakê ye jî, ev jî rastiya Kurdan û girêdana wan a bi welêt e, ji ber wê jî heke Kurd azad nebin nikarin



evînê jî pêk bînin.
Têkildarî rola jinan di çêkirina rêzefîlmê de, Hicran Çîçek got: “Di şoreşa Rojava de jinan roleke sereke lîst, me jî pêşengtya wê ya ji şoreşê re, girêdana wê bi welêt ve û evîna wê bi azadiyê re di karê xwe de anî ziman.”
Di encama êrişên artêşa Tirk a dagirker ên li dijî herêmê de, xebatên çêkirina rêzefîlmê hinekî rawestiyan ku dîmenên wê li gelek deverên cuda yên Rojava hatine kêşan, wek bajarên Dêrik, Qamişlo, Hesekê û navçeya Şedadê.
Endamê Komîna Fîlman a Rojava Mesûd Kirad ku wî jî di kêşana rêzefîlmê de cih girtiye, wiha axivî: “Em neçar man ku her demekê cihê kêşanê bighuherin, em ji Dêrikê çûn Qamişlo piştre me berê xwe da Hesekê û ev jî gelek dem û ked ji me xwest, lê tevî wê jî me xebata xwe ranewestand.”
Dema weşandina rêzefîlmê hê nehatiye diyarkirin. Tê zanîn ku ev rêzefîlm, piştî rêzefîlma Tava Sor, Evîna Kurd duyemîn rêzefîlm e ku li Rojava tê kêşandin. -***ANHA***

Sudoku:Pirs 42

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 4 | | | 1 | 2 | | | | |
| 2 | | | 4 | | | | | 6 |
| | 5 | | | | 9 | 1 | 4 | |
| | | | 5 | | | | 6 | 1 |
| | 6 | 7 | | | | 4 | 5 | |
| 5 | 9 | | | | 7 | | | |
| | 3 | 4 | 7 | | | | 9 | |
| 1 | | | | | 8 | | | 4 |
| | | | | 6 | 4 | | | 5 |

Sudoku: Bersiv 41

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 8 | 1 | 9 | 2 | 6 | 5 | 3 | 4 | 7 |
| 2 | 7 | 4 | 9 | 8 | 3 | 1 | 6 | 5 |
| 5 | 3 | 6 | 1 | 4 | 7 | 9 | 2 | 8 |
| 1 | 9 | 8 | 6 | 2 | 4 | 5 | 7 | 3 |
| 4 | 5 | 7 | 3 | 1 | 9 | 6 | 8 | 2 |
| 6 | 2 | 3 | 7 | 5 | 8 | 4 | 9 | 1 |
| 3 | 6 | 2 | 4 | 7 | 1 | 8 | 5 | 9 |
| 9 | 4 | 5 | 8 | 3 | 2 | 7 | 1 | 6 |
| 7 | 8 | 1 | 5 | 9 | 6 | 2 | 3 | 4 |

## Quncika Têgînan

| Bîrdozî | **Nêrîna li cîhanê, nêrîna ramyarî, hizir û ramana siyasî, çandî û civakî. Îdeolojî: Bîrdoziyên dewletan ne ji bo civakan in.** |
|---|---|
| Efser | Di leşkeriyê de kesên bipaye, kesên fermanan bidin. |
| Hişmendî | Zêhniyet, nêrîna mirov li xwaza, mirov, bûyer û cîhanê. |
| Semyan | Kesê/kesa xwedîtiyê li malbatê dike. |
| Sermiyan | Mal, milk, mita, kapîtal. |
| Seranser | Tev, ji serekî heta serê din: Ez li seranserê bajêr geriyam min nedît. |
| Seresere | Karê bê girîngî hatî kirin: Karê xwe seresere dike. |
| Serwer | Di malbatê de kesê guhê xwe dide dêvabên xwe û bi karê malê re eleqedar |
| Perestin | Di aliyê olî de îbadetkirina ji bo hebûnekê û baweriya pê. Hebandin. Weke pûtperest, çêlekperest, Xwedaperest... |
| Perestgeh | Ciyê perestinê, ciyê îbadet lê tê kirin. Weke mizgeft, dêr û hwd. |

## Kongera Star: Her jina ku dilê wê ji bo adaziyê lê dide emê li pişt bin




Di salvegera 18`an ya damezrandina Kongra Star ê de peyama Kongreyê ji bo jinên Cîhanê ew bû ku, wek rêxistina Star ewê li pişta tevahî jinên Cîhanê û her jina ku dilê wê ji bo azadiyê lê dide, bin. Herwiha bangawazî jî ew bû ku, jin li her qadê têkoşîna azadiyê bide meşandin. ***R-2***

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1032 18-Çile- 2023 www.ronahi.net/ku/

# KURD LI DIJÎ RÛREŞIYA CÎHANÊ CANÊ XWE DIDIN BER AGIR!

Ciwan û walatparêzên Kurd li dijî tecrîda girankirî ya li ser Rêber Apo agir berdidin bedena xwe û hêvî dikin ku bi ‘egirê bedena wan Îmraliyê Ronî bike û tecrîd bê şkandin. Veysî Taş û Mehmed Akar li ser şopa şehîdên azadiyê, ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo û li dijî **BÊDENGIYA CÎHANÊ** canê xwe dan ber agir!



***Ronahiya agirê ku digire bedena min bila Îmraliyê ronî bike**
Mehmed Akar: Ji Rêber Apo agahî nayê girtin. Ne destûra malbata wî ne jî destûra parêzerên wî tê dayîn ku hevdîtinê bikin. Êdî em ji rewşa tenduristiya Rêber Apo bi fikar in. Ez jî li dijî vê yekê li Birca Keçikan a Amedê bedena xwe didim ber agir. Ronahiya agirê ku digire bedena min bila Îmraliyê ronî bike. Ez hêvî dikim ku wê ev çalakiya min bibe wesîleya azadiya fizîkî ya Rêber Apo. Bijî Serok Apo, Bijî Serok Apo, Bijî Serok Apo.
***Divê em li Serokê xwe xwedî derkevin**
Veysî Taş: Ev çalakiya min ji bo Serokê Kurdistanê Abdullah Ocalan e. Ev 22 meh in tecrîdkirî ye. Em gelê Kurd divê xwedî li Serokê xwe derbikevin. Ez bi rûkenî diçim. Ez bi eşq û îradeya xwe diçim. ***R-3***

## Parêzeran: Rapora xwe ya Îmraliyê eşkere bikin

Parêzerên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan serî li CPT’ê dan ku rapora xwe ya derbarê serdana Îmraliyê eşkere bike. ***R-3***




## Piştî 4 sal û 4 mehan daneşîna yekê ya doza Malbata Şenyaşar dest pê kir!

Danişîna yekê ya doza ’ Komkujiya Nexweşaneyê’ ya ku 3 kesên Malbata Şenyaşar tê de hatibûn qetilkirin, piştî 4 sal û 4 mehan li 5’emîn Dadgeha Cezayê Giran a Meletiyê dest pê kir. ***R-3***




## Koçberên Efrînê : Topên dijmin nikarin têkoşîna me bidin sekinandin



Bi nêzîkbûna salvegera 5’an ya dagirkirina Efrînê, koçberên Efrînê dan zanîn ku dagirkeriya Tirkiyê kêliyekî jî di hovîtiya xwe de gav paş de neavêtiye û wan jî, kêliyekî dest ji berxwedaniyê berneda ye. ***R-5***


## ’Jineolojî qada heqîqetê ye’





Endama Navenda Lêkolînên jîneolojî Yasîmîn Mihemed da zanîn ku Jîneolojî zanista derxistina weteya raste, qada heqîqetê ye e û got, armanca konferans û komxabtên ku ji aliyê Navenda Lêkolînên Jineolojî ve tê li darxistin, pêşxistina hişmendiya jinê û civakê ye û lêgerîna heqîqetê ye. ***R-6***

Yekitiya Rewşenbîran a Herêma Cizîrê helbestvan Bêbuhar bi bîr anî **R-6**

Zeki Bedran
Gelên Sûriyê di nav... R-5


Dilyar Cizîrî
Ne tesadufe rapor.... R-4


Sozdar Demîr
Agirê Weysî Taş’an... R-2

# Kongra Star: Her jina ku dilê wê ji bo adaziyê lê dide em ê li pişt bin

**Di salvegera 18`an ya damezrandina Kongra Star ê de peyama Kongreyê ji bo jinên Cîhanê ew bû ku, wek rêxistina Star ewê li pişta tevahî jinên Cîhanê û her jina ku dilê wê ji bo azadiyê lê dide, bin. Herwiha bangawazî jî ew bû ku, jin li her qadê têkoşîna azadiyê bide meşandin.**

**Darîn Silê/Qamişlo**

Bi dirûşma `Bi Rihê Têkoşîna Şoreşa Jinê Emê Jin Jiyan Azadî Bi Ser Bixin` di salvegera damezrandina Kongra Star ê (15`ê Çile) de Kongreya Star ê konferansa xwe ya 9`an li navenda Serdem ya Çandê li bajarê Hesekê li dar xist.

Kongreya Star 15'ê Çileya 2005`an bi navê Yekîtiya Star hat damezirandin. Lê di kongreya 6'an ya 25`ê Sibat'a 2016`an de, navê wê bû Kongreya Star. Kongre ji bo hembêzkirina tavahî jinan hatiye avakirin, 18 sal in li ser fikrê Rêber Abdullah Ocalan, ji tevahî jinên Kurd û yên cîhanê têdikoşe. Herwiha bi armanca birêxistinkirina jinan û têkoşîna li hemberî zihniye-




ta bi hezar salan, di nava civakê de hatî çandin û li ser jinê tê meşandin Kongreya Star hat avakirin. Kongre jinên tevayiya pêkhateyên civakê di nava xwe de qebûl dike. Bi hev re û bi yek dengî kar û xebata jinan dike û mafê jinan diparêze.

Derbarê kar û xebata Kongra Star'ê, herwiha lidarxistina Konferansa wê ya 9`an de Koordînasona Kongra Star û jinên ku li konferansê amade bûnyîn de, nêrînên xwe anîn ziman.

### `Kongra Star piştgiriya tevayiya jinên cîhanê dike`

Koordînasyona Kongra Star Rîhan Loqo di destpêka axaftina xwe de bîr xist ku şaxên Kongra Star li her cihî belav bûne û axaftina xwe wiha domand: "Piştî şoreşa Rojava Kongreya Star li seranserê bakur û rojhilatê Sûriyê, sazî û navendên xwe vekirin. Herwiha Kongre ne tenê piştgirî û rêxistina jinên bakur û rojhilatê Sûriyê tenê tenê dike, ya tevayiya jinên cîhanê dike û têkîliya xwe bi tevayiya jinan re datîne."

### `Me li dijî êrişan xebat û têkoşîna xwe berfirehtir kir`

Rîhan di berdewamiya axaftina xwe de behsa xebata Kongrê ya herdû salên dawî kir û wiha got: "Tevî ewqas êriş û kiryarên hovane yên dagîrkeriya tirkî, herwiha hedefgirtina gelek pêşengên jin, di herdû salên dawî de me xebata xwe neda seknandin. Dijberî wê me li dijî êrişan xebat û têkoşîna xwe berfirehtir kir. Ji bo wê jî di van herdu salan de, me hêza xwe ji tevayiya cîhanê re diyar kir û em bûn nimûneya jinên şoreşger."

'Emê serhildan û dirûşmeya `Jin, Jiyana, Azadî` xurttir bikin'

Rîhan da zanîn ku armanca Konferansa Kongreyê ya 9`an ew bû ku em dengê xwe bighînin tevahî cîhanê. Herwiha emê serhildan û dirûşmeya `Jin, Jiyana, Azadî` xurttir bikin.

Koordînasyona Kongra Star Rîhan Loqo, di dawiyê de bal kişand ser peyama Kongreyê ya di Konferasna wê ya 9`an de û ji jinên Cîhanê re got, peyama me ew bû ku, wek rêxistina Star emê li pişta tevahî jinên Cîhanê û her jina ku dilê wê ji bo azadiyê lê dide bin. Herwiha bangawaziya me jî ew ku, jin li her qadê têkoşîna azadiyê bidin meşandin.

Hevseroka Kongreya Îslama Demokratîk Delal Xelîl ku ew jî beşdarî Konferansa 9`an ya Kongra Star bûbû, damezrandina kongrê li Rêber Abdullah Ocalan û li tevayiya jinan pîroz kir û ev nirxandin kirin: "Ev konferans ji bo me pir giringiya wê heye. Lewra tevayiya mijar û rewşa jinan tê de hat nirxandin û biryarên nû ji bo pêşxistin û xurtkirina asta jinan hatin derxistin."

### `Wê sala 2023`yan bibe sala serkeftin û azadiya jinê`

Delal Xelîl di dawiyê de got, wek jin em bi xebata kongerê pir kêfxweşin, ji ber ku di van herdû salan de gelek kar û proje ji bo jinê hatin pêşkêşkirin. Herwiha gelek destkeftiyên jinê hatin bidestxistin. Ji bo wê jî em, di wê baweriyê de ne ku di rojên pêş de jî wê serkeftineke mezin were bidestxistin û sala 2023`yan wê bibe sala serkeftin û azadya jinê.





### Bîlançoya çalakiyên Kongra Star yên herêman

Herêma Cizîrê: Hejmara civînan 2 hezar û 176, Semîner 1925, Serdan 18 hezar û 994, Daxuyanî 489, Meş 181, Şahî 110, Perwerdeyên girtî 5, Perwerdeyên vekirî 20, Konê çalakiyê 22, Panel 220, Hevpeyvîn 2 hezar û 800.

Herêma Firatê: Civîn 12 hezar û 500, Şahî 10, Konên çalakiyê 4, Perwerde 8, Daxuyanî 18, Meş 42, Serdan 22000, Semîner 60.

Herêma Efrîn, Şehba û Helebê jî: Civîn 12 hezar û 692, Serdan 168 hezar û 447, Daxuyanî 69, meş 60, Semîner 1457, perwede 703, Nîqaş bi jinan re 2351, Niqaş bi mêran re 38, Roportaj 1726, Şahî 6, Hevpeyvîn 365.

### Plansaziya Konferansa 9`an ya Kongra Star

1- Biriyarên ku di civîna salane ya Kongra Star ya 2022 de hate girtin û neketine meriyete, derbazdare.
2- Ji bo şikandina pergala tecrîda Îmralî û ji bo belavkirina raman û dananasîna paradigmaya Rêber APO avakirina Komîteya Azadiya Rêber Apo.
3- Konferanseke li ser paradîgmaya Rêber Apo were li darxistin.
4- Hemû xebatên kanton û saziyên Kongra Star li gorî pêşengtiya Şerê Gelê Şoreşgerî werin pêşxistin û rêxistinkirin.
5- Biriyarên ku di sala 2022`an di konferans û cîvînên kanton û rehendên Kongra Star de hatin girtin ji aliyê kongrê de tê erenîkirin.
6- Zeynep Sarûxan, Ciya Hogir, Heval Çîçek weke sembolê berxwedana gel werin pênasekirin.
7- Akademiya navendî ya li Rîmêlan Akademiya Star ya Şehîd Leyla Agirî were binavkirin, Akademiya duyemîn ya nevendî li Haseke bi navê Akademiya Star ya Şehîd Zeyneb Sarûxan were avakirin.
8- Ji bo demokratîkkirina malbat û têkoşinkirina li hember cînsîyetperestî û ji bo gohertin û vegohertina heşmendiya mêr, avakirin û rêxistinkirina rehenda hevjiyana azad.
9- Ji bo komîn bigihêje rastiya xwe ya cewherî û komînên jin ji nû ve werin birêxistinkirin, saziyên peywendîdar re nîqaşên hevpar werin pêşxistin.
10- Ji bo çalakkirina komînên jin di her kantonê de herêmên pîlot werin diyarkirin.
11- Ji bo pêşxistina polîtîkaya hevbeş ya darayî, avakirina meclîsa jin ya darayî 12- Avakirina Desteya Dîsîplînê ya Kongra Star.
13- Avakirina Komîteya Parastina Cewherî ya Kongra Star
14- Avakirina pirtûkxaneya jin.
15- Ji bo teşwîqkirina xxwendinê û pêşxistina çanda xwendinê kampanya, xebat û plansaziyên curbicur werin rêxistinkirin.
16- Avakirina Parka Jina Azad bi navê Jîna Amînî.
17- Avakirina Gundeke Modêl.
18- Ji bo perwerdekirin û pêşxistina kadroyên Kongra Star vekirina dewreyên perwerde li gorî biranşan (aboriya komînal, perwerdeyên akademîk, siyaseta demokratîk, dîplomasiya civakî, qada civakî) û mêşandina xebatên pir alî.
19- Ji bo xurtkirina xebatên qadên Ewropa, Lubnan, Şam, Başûrê Kurdîstanê plansazî û projeyên curbicur werin pêşxistin.
20- Ji bo rêxistinkirina pergal û misyona Malên Jin di nav 6 mehan de çêkirina konferansa Mala Jin.
21- Bi tevgerên ekolojî yên cîhanê re têkîlî û îtîfaqên demokratîk werin pêşxistin.
22- Ji bo xebatên ragihandin û dîplomasî kadro were amadekirin û li gorî pêwîstî ji bo qadan were vesazkirin.
23- Ji bo demokratîkkirina ola Îslamî û pêşxistina dîyalogên di navbera ol û baweriyên li Surî, xebatên pir alî hatin mêşandin.
24- Ji bo pêşxistina pergala hevserokatî di warê teorîk, rêxistinî û polîtîk de plansaziyên berfireh werin pêşxitin.
25- Koma lêhûrbûnan dîsa were rêxistinkirin.
26- Ji bo kampên koçber çêkirina projeyan.
27- Ji bo xurtkirina xebatên gûndan û zindîkirina jiyana gundan destpêkirina hamleya rêxistinî.
28- Ji bo jinên ku fuhuş dikin pêşxistina projeyên perwerdekirin û qazanckirina wan.



## Agirê Weysî Taş'an wê tecrîda li îmraliyê parçe bike

Sozdar Demîr

Dewleta Tirk a dagirker roj biroj, tecrîda li Îmraliyê ya li ser Rêber Ocalan û girtiyên din, giran dike. Tirkiyê armanc dike ku bi rêya vê tecrîdê gelê Kurd û Rêber Abdullah Ocelan ji hev qut bike. Lê belê gelê ku bi fikir û felsefeya wî xwe bi rêxistin kiriye, diyare ku wê tu carî serî li dijî neheqî û bê adeletiyê netewînin. Ji ber ku îro ev gel bi yek dengî banga azadiya Rêber Abdulah Ocalan dike.

Ev 24 sal in ku Rêber Apo di nava çar dîwaran de ye. Ji xwe 12 salên destpêkê mafê hevdîtinê yê Rêber Apo hat astengkirin û di 24'ê Adara 2021'an û heta niha jî ti agahî jê nayên girtin. Herî dawî jî, dîsa bi hincetên vala 3 meh cezayê disîplînê li ser birîn. Ev tecrîda giran ya ku li ti deverên cîhanê nehatî kirin, li ser Rêberê kurd Abdullah Ocelan tê ferzkirin.

24 salin ku gelê azadixwaz û gelê kurd banga azadiya Rêber Apo dikin û ev 22 mehin bê navber gel ji bo azadiya wî li ser piyane û di nava çalakiyan de ne.

Heta niha evqas bangên ku ji Kurdistanê û derveyî welat têne kirin jî, lê dewletên cîhanê çavên xwe girtine û xwe li bêdengiyê dani ye. Çima evqas tecrîd? Çima ev bêdengiya cîhanê? Çima Rêber Apo?

Ger ku ev tecrîda li ser Rêberê me kurdan tê meşandin, li ser serokekî walatekî din hatiba meşandin, wê hemû cîhan di nava seferberiya azadiya wî de bûna. Lê belê ji ber ku Rêber Apo yekane kese ku ji hemû gelên bindest û ji azadiya jinê re bûye hêvî, ji ber wê evqas tecrîdê li ser giran dikin û qaşo yên ku dibêjin em li dijî tecrîd û êşkenceyê ne jî, xwe li bêdengiya mirinê danîn e. Qaşo CPT'î Komîteya Pêşîlêgirtina Êşkenceyê ye, lê yê ku ji êşkence û tecrîdê re çavên xwe digre û xwe li bêdengiyê datîne jî, despêkê CPT'î ye. CPT bi vê helwesta xwe diyar dike ku bi dewleta Tirk a faşîst re hevkara vî Suci ye.

Di rewşeke wiha de jî, CPT bi daxuyanî û bê helwestiya xwe gumanên gelê Kurd û tevgera azadiyê ji bo rewşa Rêber Apo hîn zêdetir kiriye. Li ser van rewşan hemûyan jî, gel helwesta xwe tund nîşan dide û nerazîbûnên gel di astek herî jor de ne. Yek ji mînakên van çalakiyan jî çalakiya şehîd Veysî Taş yê ku ji bo şikandin û şemzarkirina vê tecrîdê, agir berda bedena xwe. Veysî Taş bi vê çalakiya xwe xwest vê peyamê bide; "dewleta Tirk a faşîste, lê heya kurdek hebe û heta azadiya fîzîkî ya rêber Apo bi dest nekeve, wê bi ruhê çaran vê têkoşînê bidomînin û wê bi vî ruhî, azadiya Rêber Apo mîsoger bikin. Lê dewleta Tirk a faşîst û CPT'î jî, baş dizanin ku çawa ku Rêber Apo di nava çar dîwaran de kariye bibe îradeya gelekî, wê ev gel jî elbet ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo canê xwe jî bidin û heta dawiyê wê li ser piya bin û dinava berxwedanê de bin.



# Ziman jî dibin deshilatdar!

Nivîskar Sîdar Jîr da zanîn ku divê Wêjeya Kurdî bibe milkê dinyayê û got: "Ya girîng divê wêjeya Kurdî, Erebî, Farisî û Tirkî baypas bike. Ji ber ku her sê jî zimanên hegemon ên li ser zimanê Kurdî ne û dixwazin li ser ziman jî bibin desthilatdar."

Nivîskarê "Dozdeh Çirk", "Handa", "Nasnameya Wêjeyê" û "Şerm"ê Sîdar Jîr têkildarî wêjeya Kurdî û zimanê Kurdî axivî, got, bipêşketina wêjeya Kurdî girêdayî perwerdehiya bi zimanê dayikê ye: "Heta ziman nebe zimanê perwerdehiyê, dibe ku ew pirsgirêk hê kûrtir bibe."

### Em ê çîroka xwe çawa bikin milkê wêjeya dinyayê?

Çîroknûs û romannûs Sîdar Jîr anî ziman ku çîrok xwedî dîrokeke kevnare ye û wiha dewam kir: "Her netewe û ziman xwedî kodên xwe yên civakî û dîrokî ye. Çîroka Kurdan jî li gorî kodên civaka Kurdan teşe û dirûv girtiye. Ev sed sal in ku çîroka Kurdî ya nivîskî ber bi nûjênbûnê ve diçe. Çîroka Kurdî bi kovar û rojnameyan belav bûye. Hejmar kêm be jî çîroknûsên Kurdî ku di asta cihanê de dinivîsin, hene û çîrokên gelek serketî jî dinivîsin. Çi qasî xwedî li çîroka klasîk bê derketin, çîrokên nivîskî jî wê ew qasî xurt bibin û li ser koka xwe şîn bibin. Lê êdî dinya jî çîrokê bêhtir, ber bi roman yan jî çîrokên dirêj ve diçe. Lê ya girîng em dê çi qas çîroka xwe û wêjeya xwe bikarin bikin milkê wêjeya dinyayê."

### Ji bo romanê wext hewce bû

Jîr got, wî di 16 saliya xwe de dest bi nivîsandina çîrokê kiriye û derbarê nivîskariya xwe de jî wiha peyivî: "Ez di destpêka sala xwe ya 16'an de bûm, min dest bi nivîskariye kir. Hem 'Dozdeh Çirk' hem jî 'Handa' weke roman bûn. Her wêjevanekî derdekî wî heye ku bi rêya wêjeyê parve dike. Hinek helbestan dinivisînin, hinek roman, hinek jî çîrokan, lê ya min ne helbestê têrê dikir ne jî min têrî helbestê dikir. Ji ber wê, min çîrok nivisî, lê derbasbûna min a romanê ji 2014'an û şûn ve bû. 'Dozdeh Çirk' ên ku cidî li ser disekinin, dizanin ku ew romaneke parçekirî ye. Lê 'Şerm' û çend pirtûk li ber destê min in, ew ji sedî sed roman in. Yanî ji bo romanê dibe ku hinek wext hewce bû ji bo min, edî wext jî hatiye."

### Divê Kurdî, Erebî, Farisî û Tirkî baypas bike

Sîdar Jîr armanca wêjeyê bi bîr xist û got, divê wêje pêşengiyê ji civakê re bike: "Ya girîng, divê wêjeya Kurdî, Erebî, Farisî û Tirkî baypas bike. Bi taybetî di mijara wergeran de em di ser Erebî, Farisî û Tirkî re hewl nedin ku xwe bigihînin dinyayê. Ji ber ku her sê zimanên hegemon ên li ser zimanê Kurdî dixwazin li ser ziman jî bibin desthilatdar. Yanî heke yek bixwaze, dikare rasterast bi wan zimanan binivîse, lê pirsgirêka me ya sereke divê wêjeya me bibe milkê dinyayê. Yanî bibe parçeyekî xurt yê wêjeya dinyayê. Ji bo wê jî divê berhemên Kurdî rasterast ji zimanê Kurdî bên wergerandin, ne ji zimanekî din. Çawa yên Elmanî ji Elmanî, yên Fransî ji Fransî, yên Kurdî jî divê bi vî awayî bin."

### Divê nivîskar li nav civaka xwe be

Jîr got, ji ber zext û tundiyan gelek nivîskarên Kurd yan di girtîgehê de ne yan jî ji derveyî welêt dinivisînin û wiha pê dê çû: "Dema em nivîskar bi awayekî fizîkî jî dûrî hev bin, nivîsandin jî zehmet e. Yanî dema nivîskarek bixwaze behsa Cizîra Botan yan jî cihekî Kurdistanê bike, divê here wir, bi qasî ku têrî nivîsandinê bike li wir bijî, lê ev niha pirsgirêk e. Lê ne pirsgirekeke niha ye. Rojnameya Kurdî ya yekem Kurdistan ne li Kurdistanê li Misirê ava bû. Heman pirsgirêk îro jî ji bo wêje û rojnamegeriya Kurdî lê ye. Beriya bi125 salan jî heman pirsgirêk hebû. Heke tu li nava civaka xwe bî, tu dê bêhtir afirîner û xurttir bî. Heke bi awayekî fizîkî û hişmendî ez ne li nava civaka xwe bim, ez ê karibim çi biafirînim. Lê di gel astengiyan hemûyan jî ez bawer dikim nifşên nû heke bi ber bayê populîzmê nekevin, wêjeya Kurdî dê bi pêş bikeve."

### Bipêşketina ziman girêdayî perwerdehiyê ye

Di dawiya axaftina xwe de Sîdar Jîr got, bipêşketina Wêjeya Kurdî jî girêdayî perwerdehiya fermî ya zimanê Kurdî ye û bi van gotinan dawî li axaftina xwe anî: "Ji bo xwendina Kurdî û berhemên wêjeyî yên Kurdî xurt derkevin, divê



perwerdehiya fermî ya bi zimanê Kurdî hebe. Heke perwerdehiya bi zimanê Kurdî tine be, heta demekê nivîskar û hunermend wê li ber xwe bidin, lê ew kar tenê di malan de nameşe. Divê statuya zimanê Kurdî hebe. Heke statuya zimanê Kurdî hebe, xwendevan jî dê zêde bibin. Heke xwendevan zêde bibin, nivîskarên xurt dê derkevin holê û berhemên xurt dê bên nivîsandin. Wê demê wêje jî dibe weke sektora di nava jiyanê de. Yanî pirsgirêka sereke perwerdehî ye. Ne tenê ji aliyê wêjeyê ve jî ji aliyê rojnamegeriya Kurdî û hunerê ve jî pirsgirêk e. Heta ziman ne be zimanê perwerdehiyê, dibe ku ew pirsgirêk hê kûrtir bibe."

*M.A*

## Yekitiya Rewşenbîran a Herêma Cizîrê helbestvan Bêbuhar bi bîr anî

**Di salvegera 14'emîn ya koça dawî ya helbestvanê Kurd Yûsif Berazî (Bêbuhar) de, Yekitiya Rewşenbîran a Herêma Cizîrê di parka Xwendinê ya Qamişlo de şevbuhêrkeke helbestan li dar xist.**

Bi boneya salvegera 14'emîn a koça dawî ya helbestvanê Kurd Yûsif Berazî (Bêbuhar), Yekitiya




Rewşenbîran a Herêma Cizîrê şevbuhêrkeke helbestan li parka Xwendinê ya bajarê Qamişlo bi beşdariya bi dehan rewşenbîr û şêniyên bajêr li dar xist.

Di serî se endama yekitiyê Hesîne Ehmed der barê rola helbestvan Bêbuhar de di pêşxistina wêjeya Kurdî de di rewşên zehmet de, her wiha rola wî di pêşxistina hunera Kurdî de, ku gelek helbestên xwe dabûn hunermendên mezin wek Mihemed Şêxo û Ciwan Haco, axivî.

Piştre, dîmenek a kurê helbestvan Bêbuhar, Xisro Yûsif Berazî hat pêşandan, ku tê de behsa jiyana bavê xwe dike, her wiha sînefizyonek li ser jiyana helbestvan û berhemên wî yên ku wî bi dengê xwe xwendine, hat pêşandan.

Her wiha, helbestvan Şama Mihemed, Newaf Mela Beşîr û Cemîl Tahir bi xwendina helbestan beşdarî şevbuhêrkê bûn.

Şevbuhêrk bi pêşkêşkirina şanoyekê li ser jiyana helbestvan ji aliyê koma dibistana şanoyê ya Desteya Çandê ya Herêma Cizîrê ve hat pêşkêşkirin.

Hêjayî bibîrxistinê ye ku helbestvan Bêbuhar di sala 1931'an de li gundê Til Cerciye yê herêma Babê ya rojhilatê bajarê Helebê ji dayîk bûye, piştre bi malbata xwe re berê xwe daye Serêkaniyê û ji sala 1943'yan ve dest bi nivîsandina helbestan kiriye û di 15'ê Çileya 2009'an de koça xwe ya dawî kiriye.

*-ANHA*

## Ebdo Resûlo bi çêkirina tenbûran pîşeyê bav û kalên xwe didomîne

**Ebdo Resûlo yê ku li gundê Ziyaretê ya Şêrawayê dimîne, bi çêkirina tenbûran hem pîşeyê bav û kalên xwe didomîne hem jî debara xwe dike.**

Ebdo Resûlo yê ji navçeya Cindirês a Kantona Efrînê ye, piştî dagirkeriya dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê, neçar dibe ku koçî gundê Ziyaretê ya Şêrawayê bike. Ebdo Resûl ligel şert û mercên şer ên dijwar ji bo ku debara xwe bike, bi çêkirina tenbûran pîşeyê bav û kalên xwe dewam dike.

### ÇÊKIRINA TENBÛRAN HUNEREKÎ CIVAKÎ YE

Ebdo diyar kir ku, çêkirina tenbûran hunerekî civakî ye û got, "Ji ber ku çêkirina tenbûran hunerekî civakî û pîşeyî yê bav û kalên me ne, li gorî şert û mercên heyî em hewl didin dewam bikin. Her mirov ji bo debara xwe bi karek re mijûl dibe, min jî ev pîşe hilbijart. Dema ku mirov darekî bêteşe tîne û li ser dixebite teşeyekî dide, bêguman kelecanî dibe. Hestek a hilberînê



di mirovan de ava dike."

### ŞÊWAYÊ ÇÊKIRINA TENBÛRÊ

Ebdo wiha qala şêwaza çêkirina tenbûran dike, "Ji bo ku temena tenbûrê dirêj be û dengê wê xweş be cureyek e daran diyar heye. Mînak darên guzê û tûyê tên bikar anîn. Ji ber rewşa koçberiyê û şert û mercên şer, li gorî derfetên heyî û darên heyî yên kevn hatine birîn, em tenbûran çêdikin. Di destpêkê de dar weke kutik li cem necar tên qutkirin, piştre weke şivikan tên derxisitin. Ew şivikên ku hatine qutkirin ji bo ku nerm bibe, di avê de tên hêştin. Piştî ku demeke dirêj di avê de dimîne li ser qalbê wê tê rêxisitin û tên germkirin. Li gorî wê ew şivik hişk dibe û li ser qalibê hatî danîn teşe digire. Piştre ew şivik tên êgekirin û li gorî çêkirina tenbûrê dîsa tên qutkirin. Di dawiyê de ew şivik bi tûtqalê bi hevdu ve tên zeliqandin û gewdeya esasî ya tenbûrê tê çêkirin."

Ebdo Resûlo anî ziman ku ji ber şert û mercên koçberî û kêm derfetiyê ew nikarin tenbûrên tên xwestin çêbikin û got ku, heya derfeta wî hebe ew ê vê pîşeyê berdewam bike. *-ANF*

# ’Jineolojî qada heqîqetê ye’

**Endama Navenda Lêkolînên jîneolojî Yasîmîn Mihemed da zanîn ku Jîneolojî zanista derxistina weteya raste, qada heqîqetê ye e û got, armanca konferans û komxabtên ku ji aliyê Navenda Lêkolînên Jineolojî ve tê li darxistin, pêşxistina hişmendiya jinê û civakê ye û lêgerîna heqîqetê ye.**

**Zana Roj/ Şehba**

Xebatên jineolojiyê li qadeke berfireh tên kirin, hem li hemû beşên Kurdistanê û herêmê, hem li qada navneteweyî tên pêşxistin. Li gorî qadan giranî daye ser mijarên lêkolîn û nîqaşan. Li hin cihan giranî dide ser şîroveyên bandora ol, felsefe û mîtolojiyê; li hin cihên din jî giranî dide ser felsefe, aborî û hevjiyana azad. Qadên Jineolojî berê xwe didê û lêkolîn jî dike, qadên rasterast ên civakê ne û hem jî tevgerên jinan, tevgerên civakî û femînîst û ekolojiyê û hwd in.

Ji bo pêşxistina hişmendiyê, avakirina civakeka demokrat û bi rêxistinkirî, beriya du salan Navenda Lêkolînên Jineolojî li ser asta herêma Şehbayê û Helebê hatiye avakirin. Navend ji avakirina civakeke demokratîk û şîrovekirina hin têgehan, bi dehan komxebat li herêma Şehabyê li darxistîn e. Li ser vî esasî jî di 10’ê vê mehê de, Yekemîn Konferansa Zanistî Ya Navenda Lêkolînên Jineolojî hat li darxistin.




Têkildarî girîngiya xebatên Jineolojî û Yekemîn Konferansa Zanistî ya Navenda Lêkolînên Jineolojî endama Komîteya Amadekar ya Konferansê Yasmîn Mihemed ji rojnameya me re axivî.

**’Jineolojî qada heqîqetê ye’**

Yasmîn Mihemed diyar kir ku xebatên Jineolojî giştî civakê digre dest, ew qada heqîqetê ye û wiha got: “Jineolojî zanisteke civakî ye. Yekem car ji aliyê Rêber Apo ve hatiye pênasekirin. Ji destpêka derketina û belavbûna wê ve, xebatên wê gîştî civakê digire nava xwe. Armanca wê jî, pênasekirina rast ya jin û civakê, avakirina civakeke demokartîk ku li ser bingeha wekhevî û demokrasiyê jiyan bike ye. Li ser wî esasî em hewil didin ku vê zanistê bikin îdeolojiyeke gîştî û ew bûye navenda hemû xebatên jinê.”

**’Zanista jin û jiyanê bi têgînên rast dikare were jiyîn’**

Yasmîn diyar kir ku komxebatên wan yên Jineolojî li ser bingeha wekhevî, xwenaskirin û hevsengiyê ji herdû zayendan re hatin e li darxistin û wiha domand: “Armanca me ji komxebat û civînên ku hatine li dar xistin, ew e ku her kes xwe nas bike û têgînên ku ji aliyê gel ve bi şaştî hatine famkirin, rast werin şîrove kirin. Mînak weke şîrovekirina rast ji (têgîna şeref, namûs, herwiha nêzîkatiya civakê ji jinê re, ji zarok û malbat çiye? Avakirina malbateke demokratîk çawa ye?) Di komxebatên me de ev hatin destgirtin û nîqaş kirin. Di heman demê de ji bo jin mijarên weke xwebûna jin çiye? Jin dikare xwe îfade bike yan na? û hwd, di encama van de lêhurbûnên nû derketin holê û em têgihîştin ku zanista jin û jiyanê dikare bibe malê tavahî civakê û ji aliyê herdu zayendan ve bi awayekî rast were jiyan kirin.”

**Encamên ku navenda lêkolînên jineolojî xwe gihandiyê**

Yasmîn derbarê armanaca lidar-



xistina Yekemîn Konferansa Zanistî ya Navenda Lêkolînên Jineolojî wiha got: “Di encama lêkolîn û xebatên ku me di du salan de dane meşandin de, em gihîştin hin encaman bi taybet ji bo jinê, yek ji wan encaman jî pêşxistina aliyê aborî ya jinê, guhertina hişmendiya ku aboriya jin girêdayî ya mêr dike; tundiya li ser zarokan ku ji aliyê civakê ve tê kirin, di heman demê de mijara tundiya medya ya dijîtal ku herî zêde tê de piropoganda li dijî jinê tê kirin û jin di encama nêzîkatyê şaş dibe qurbanî, herî dawî mijara hezkirina jin ji jinê re divê baş were naskirin. Ji bo tevahiya jinên herêmê em ê di demên pêş de jî li ser van xalan, xebatên xwe bidin meşandin.”

# Hesen Cudî: Li Başûrê Kurdistan şerê taybet bi sê rêyan tê meşandin

**Nivîskar û rojnamevan Hesen Cudî semînerek li ser şerê taybet û metirsiya wê ya li ser civakê da. Hesen Cûdî diyarkir ku şerê taybet di nava civakê de sê çînan hedef digre, ya yekem jin, ya duyem ciwan û ya sêyem jî zarokin. Her wiha got, niha li Başûrê Kurdistanê bi sê rêyan şerê taybet tê meşandin.**

Di saetên êvarê de li Salona Xak a Silêmaniyê bi amadebûna hejmarek zêde ya welatiyan a ji beşên cûda yên civakê, nivîskar û rojnamevan Hesen Cudî semînerek di derbarê şerê taybet û metirsiya wê ya li ser civakê de pêşkêş kir. Semînerê bi deqeyek rêzgirtina ji bo giyanê şehîdan destpêkir, piştre Hesen Cudî dest bi semînera xwe kir, di destpêkê de diyar kir ku di serdema sîstema sermayedarî de wek hişmendî û sazî, ev sîstem li ser şerê taybet hat avakirin. Cudî got: “Em jî di vê serdemê de dijîn . Ji sedî 95’ê şerê dagirkeran ê li dijî Kurdan bi taybetî jî li Başûrê Kurdistanê bi şerê taybet tê kirin.”

Di dewamê de Hesen Cudî got: “Tevgera rizgarîxwaz a Kurd li hemû parçeyên Kurdistan û Ewropayê



roj bi roj mezintir dibe. Li dijî şerê taybet radiweste û têkoşîn dike. Dizanin wê çawan ev şer were hilweşandin. Divê em şerê taybet binasin ji bo rûbirûbûna wê jî amrazek bibînin.”

Li ser pênasekirina şer jî got: “Şerek heye jêre dibêjin şerê rewa yê xweparastinê. Şerek din heye şerê dagirkerane ku li beramberî gelên dixwazin bi azad bijîn tê meşandine. Dema desthilatek peyda dibe, li ser formên dewletê şer dike huner û zanist û bi wî şêwazî pênase dike. Ji bo rêvebirina wî şerî jî dikare wane û encam jê wergire. Ji wê demê ve jî şerê taybet jî bûye beşek ji wê huner û zanistê. Niha jî xistine bi şêwazê akademî û êdî pênaseyek din werdigre û jêre dibêjin hunera xapandinê. Ji mere derdikeve ku tişta ku hunerê vegerandiye şer, şerê taybete. Piraniya şerên di dîrokê de şerên taybetin.”

Di dewamê de Hesen Cudî da zanîn ku şerê taybet bi awayek plankirî tê meşandin û şerek giştgir û piraliye. Cudî got: “Şerê taybet tevayî civakê hedef digre. Şerek ruhî, fikrî û manewî ye. Ger em bêjin şahê şera ye, wê ne xelet be. Ji berku şerek aloze. Wan civakan hedef digre ew civakên ku di şerên leşkerî de binkeftin jiyan nekirine. Mîna Bakurê Kurdistan û gerîlayên azadiya Kurdistanê. Ev şer gelek caran di dema diyalog yan jî di dema aştiyê de tê meşandin.”

Di dirêjiya axaftina xwe de Hesen Cudî diyarkir ku şerê taybet di nava civakê de sê çînan hedef digre, ya yekem jin, ya duyem ciwan û ya sêyem jî zarokin. Cudî got: “Yek ji navendên şerê taybet û sîstema sermayedarî Holîwode. Sîstema sermayedarî ji piştî şerê cîhanê yê yekem û duyem ve êdî akademî û navendên taybet jêre vekiriye. Gelek lêkolîn li ser şerê taybet hatine kirin. Tenê dewleta Tirk saziyek taybet û eşkere heye ji bo şerê taybet. Li nava NATO’yê de jî dezgehek heye ji bo şerê taybet jêre dibêjin Giladyo. Hemû darbe û qetilkirina şoreşgeran ji aliyê Giladyo ve tê pêkanîn. Li tevayî Rojhilata Navîn heta Yekitiya Sovyetê jî bi şerê taybet hat rûxandin.”

Derbarê rola şerê taybet a di dosya Şengalê de jî Hesen Cûdî wiha axivî: “Şerê taybet li Şengalê jî rû da ev jî bi rêya avakirina çîna xayîn û xwefiroş pêkhat. Ti dagirkeriyek bê çîna xayîn bi sernakeve. Ev



çîna xayîn bi eşkere tê dîtin. Eger çîna xayîn li Kurdistanê nemîne, wê dagirker nikaribin tiştek bikin. Beşek ji şerê taybet bi avakirina partiyên xayîn, binemalên xayîn û kesayetên xayîn tê meşandin. Dagirker jî wî şerê xwe yê taybet bi wan xayînan birêve dibin. Wekî ku ya li dijî birêz Abdullah Ocalan, Şêx Mehmud û gelek serkirdeyên din rû dayî.”

Di dawiyê de jî Hesen Cudî got: “Divê dîroka Başûrê Kurdistanê ji nûde were nivîsandin. Niha li Başûrê Kurdistanê bi sê rêyan şerê taybet tê birêvebirin. Ya yekem bi tevgera lîberalîstan, ya duyem tevgerên Îslamî, ya sêyem jî tevgera desthilatxwazên Başûre. Ji bo wê jî dibin navê rêxistinên civaka sivîl de hewil didin civaka Kurd kontrol bikin, navendên fuhuşê jî rêyek ya rêvebirina şerê taybete.”

***- ROJNEWS***



# Gelê Kurd qêrîna xwe ya li dijî tecrîdê bi agirê bedena xwe radgîhine cîhanê!

**Ciwan û walatparêzên Kurd li dijî tecrîda girankirî ya li ser Rêber Apo agir berdidin bedena xwe û hêvî dikin ku bi ‘Agirê bedena wan Îmraliyê Ronî bibe û tecrîd bê şkandin. Veysî Taş û Mehmed Akar li ser şopa şehîdên azadiyê û ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo û li dijî BÊDENGIYA CÎHANÊ, canê xwe dan ber agir!**

**Navenda Nûçeyan**

Dewleta Tirk a dagirker Tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bênavber didomîne. Dewleta faşîst li ber cavên cîhanê û rêxistinên navneteweyî yên ku qaşo dibêjin; ‘em parastina mafê mirovan dikin’ tevaiya mafê mirovan binpê dikin. Li hemberî Tecrîdê, gelê Kurd û azadîxwazên cîhanê, bênavber li Kurdistan û li her derê cîhanê çalakiyan li dar dixin. Hêrsa gelê Kurd ya li hemberî ‘Tecrîdê’ giheştiyê asteke pir bilind. Herî dawî careke din kurdên dilsoz û şopdarên azadiyê, ji bo rakirina tecrîdê mecbûr man ku bedena xwe li ber çavê cîhanê giştî bidin ber agir.

Şeva 12’ê Çileyê, Veysî Taş yê 65 salî li dijî tecrîda li ser Rêber Apo, li Sîteya Pîşesaziyê ya Biçûk a navçeya Artuklu ya Mêrdînê, Bedena Xwe Da Ber Agir. Piştê ku Vêysî Taş rakirin Nexweşxaneya Perwerde û Lêkolînê, li wir jiyana xwe ji dest da. Cenazeyê Apê Veysî ji aliyê malbata wî ve li Goristana Taxa Îstasyonê hate veşartin.

**‘Divê em li Serokê xwe xwedî derkevin’**


Veysî Taş beriya ku bedena xwe bide ber agir, bi vîdeoyekê peyama xwe wiha parvekiri bû: “Ev çalakiya min ji bo Serokê Kurdistanê Abdullah Ocalan e. Ev 22 meh in tecrîdkirî ye. Em gelê Kurd divê xwedî li Serokê xwe derbikevin. Ez bi rûkenî diçim. Ez bi eşq û îradeya xwe diçim.”

Şeva 16’ê Çileyê jî, ciwanê bi navê Mehmet Akar yê 25 salî, li Birca Keçika ya li navçeya Sûrê ya Amedê xwe şewitandibû. Piştî Akar xwe şewitand gelek tîmên tenduristiyê û polîsan sewqî cihê bûyerê hatin kirin. Tîmên tenduristiyê Mihemed Akar rakirin Nexweşxaneya Fakûlteya Tibê



ya Zanîngeha Dîcle’yê. Mehmet Akar di nexweşxaneyê de jiyana xwe ji da.

Piştê wê hate xuyakirin ku Akar li pey xwe nameyek hiştiye. Akar di nameya xwe de wiha dibêje: “Ji Rêber Apo agahî nayê girtin. Ne destûra malbata wî ne jî destûra parêzerên wî tê dayîn ku hevdîtinê bikin. Êdî em ji rewşa tenduristiya



Rêber Apo bi fikar in. Ez jî li dijî vê yekê li Birca Keçikan a Amedê bedena xwe didim ber agir. Ronahiya agirê ku digire bedena min bila Îmraliyê ronî bike. Ez hêvî dikim ku wê ev çalakiya min bibe wesîleya azadiya fizîkî ya Rêber Apo. Bijî Serok Apo, Bijî Serok Apo, Bijî Serok Apo”

# Parêzeran: Rapora xwe ya Îmraliyê eşkere bikin

**Navenda Nûçeyan**

**Parêzerên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan serî li CPT’ê dan ku rapora xwe ya derbarê serdana Îmraliyê eşkere bike.**

Parêzerên Buroya Hiqûqê ya Asrin’ê têkildarî miwekîlên xwe yên li zîndana Îmraliyê, dîsa serî li Komîteya Pêşîlêgirtina Îşkenceyê ya Ewropayê (CPT) dan. Di serlêdanê de ji CPT’yê hat xwestin ku rapora xwe ya têkildarî serdana 20-29’ê Îlonê de, bi raya giştî re parve bike.

Di serlêdanê de hat diyarkirin ku mafên hevdîtina bi malbat û parêzeran re, name û ragihandinê tên binpêkirin. Herwiha hat zanîn ku mafên parastin û darizandina



adilane jî, tên astengkirin. Disa hat diyarkirin ku mafên navborî bi Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê (PMM) hatine mîsogerkirin û wiha hat gotin: “Rewşa ‘Incommunicado’ (agahî negirtin) hêj girantir bûye. Di nava 3 mehên dawî de bi awayekî rêk û pêk ji bo Serdozgeriya Komarê ya Bursayê û Rêveberiya Girtîgeha Tîpa F a bi Ewlekariya Bilind a Îmraliyê, serlêdan hatin kirin. Parêzeran 32 caran û malbatan jî 14 caran serî li herdu saziyan dan. Lê ev serlêdan bêbersiv hatin hiştin.”

Di berdewamê de wiha hat gotin: “Di serî de saziyên Ewropayê, ji 22 welatên cuda 350 parêzeran di 14 û di 19’ê Îlonê de, ji Rojhilata Navîn 756 parêzeran serî li Wezareta Edaletê dan. Lê ev serlêdan nehatin bersivandin û aqûbeta nameyên hatine şandin jî, nayên zanîn. Her wiha nayê zanîn bê ka nameya nû ya di 27’ê Îlona 2022’yan di dema vê raporê de hatiye şandin, gihiştiye yan na.”

**Di berdewamiya serlêdanê de ev daxwaz ji CPT’yê re hatin kirin:**

“* Divê komîteya we rapor û tespîtên xwe yên têkildarî serdana dawî ‘tavilê’ bi raya giştî re parve bike.

* Ji bo ku parêzer bikarin hevdîtinan bikin û ev hevdîtin domdar bin, hewceye hûn rê li ber biryarên derhiqûqî yên bi rêya dadgehan tên dayîn, bigirin.
* Ji bo ku malbat û vasî bikarin hevdîtinan bikin û ev hevdîtin domdar bin, divê hûn yasayên we bixwe diyarkirî pêk bînin ku rê li ber cezayên disiplînê yên derhiqûqî were girtin.

* Li gel bicihanîna mafê serdanê, her wiha divê serlêdêr bikarin mafê xwe yên hevdîtina li ser telefonê jî bi kar bînin û hûn bingeha vî tiştî amade bikin.
* Ji bo ku girtî bikarin li derve jî, bi parêzerên xwe re bi rêya name, telgraf û faksê peywendiyan deynin, hewce ye hûn erkê xwe pêk binin ku hemû astengî werin rakirin.

* Divê sepanên derhiqûqî yên ji bo qedexekirina rojname, kovar û pirtûkan bi dawî bibin.
* Divê tevdîrên xurt ên ji bo rakirina rewşa îşkence, nêzîkatiyên dermirovî û nebaş û incommunicadoyê werin stendin û prosedûrên di çarçoveya Xala 10/2. a Peymanê werin pêkanîn.”

# Piştî 4 sal û 4 mehan daneşîna yekê ya doza Malbata Şenyaşar dest pê kir!

**Navenda Nûçeyan**

**Danişîna yekê ya doza ’Komkujiya Nexweşaneyê’ ya ku 3 kesên Malbata Şenyaşar tê de hatibûn qetilkirin, piştî 4 sal û 4 mehan li 5’emîn Dadgeha Cezayê Giran a Meletiyê dest pê kir.**

Danişîna ewil a doza ’Komkujiya Nexweşaneyê’ ya ku 3 ferdên Malbata Şenyaşar ji aliyê xizm û parêzvanên parlamenterê AKP’ê yê Rihayê Îbrahîm Halîl Yildiz ve hatibûn qetilkirin, piştî 4 sal û 4 mehan li 5’emîn Dadgeha Cezayê Giran a Meletiyê dest pê kir, didome. Di çarçoveya dosyeyê de Celal Yildiz, Mekaîl Şîmşek û Enver Yildiz ê ji doza ’kargehê’ girtiye jî di nav de 19 kes bi sûcên ’Kuştina ji yekî zêdetir’ , ’hewldana kuştina ji yek kesî zêdetir’ , ’Zirar dayîna malê cemaweriyê’ , ’Veşartin û ji holê rakirina delîlên sûc’ , ’Li saziya cemaweriyê dizî’ û ’binpêkirina destnedayîna kargehê’ tên darizandin.

Danişînê piştî tespîta nasnameyan dest pê kir. Girtî Mekaîl Şîmşek û Celal Yildiz ji Girtîgeha Tîpa T ya Hejmara 2’yan a Rihayê bi SEGBÎS’ê tev li danişînê bûn. Bersûcên negirtî tên darizandin jî beşdarî danişînê bûn. Parlamenterê AKP’ê Îbrahîm Halîl Yildiz jî bi parazvanên xwe hate adliyeyê.

Pişt re baroyên Wan, Amed, Sêrt û Êlihê daxwaza mûdaxîltiyê kirin. Dozgeriyê xwest ku daxwaza mudaxîltiyê ya hemû baroyan were redkirin. Şandeya dadgehê, mudaxîltiya Malbata Şenyaşar qebûl kir û bi hinceta baroyan rast e rast zirar nedîtiye daxwaza wan




a mudaxîltiyê qebûl nekir.

Pişt re ji bersûcan Mekaîl Şîmşek ê di çarçoveya dosyayê de girtî ye ji girtîgeha lê girtî bi SEGBÎS’ê parastin kir. Dadgehê jî weke li dijî hiqûqa ûsûlê ewilî îfadeya Şîmşek a di asta hêzên ewlehiyê de xwend. Li dijî vê parêzerên Malbata Şenyaşar îtîraz kirin. Pişt re yek ji bersûcê girtî Celal Yildiz bi SEGBÎS’ê tevli danişînê bû û parastin kir, li gorî hat zanîn danaşîn a yekê didome. Hejayî bîranînê ye ku malbata Şanyaşar 680 rojin bê navber, li ber avahiyê Adeletê! Nobeta Adeletê digirin û ji bo doza yekem jî dayîka Emîne bangawazî kiribû ku hemû jin û walatiyên xwedî wijdan tevlî vê dozê bibin û li dijî bê Adeletiyê xwedî helwest bin.

Çavkanî Mezopotamya Ajans

# Kongra Star parêzvana hevjiyana azad e

**Kongra Star ji destpêka damezrandina xwe ve roleke sereke di rêvebirin û rêxistikirina jin û civakê de lîst, wek tevgerek ji bo jinên Kurd dest pê kir, lê mezin bûye û jin ji her netew û olê ve girt nav xwe.**

**Mihemed Xanim**

Kongra Star rêxistinek jin a konfederal li Bakûr û Rojhilate Suriye ye. Herwiha nûnertiyê wê li Başûrê Kurdistanê, Libnan û li Ewropa jî hene. Ew li gorî paradîgmaya ekolojîk a demokratîk ya bi azadiya jinê bawer e, tê rêxistin kirin. Li herêmên ji hêla Rêveberiya Xweser ve têne rêvebirin, di bin sîwana rêxistina Kongra Star de, civak bi rêxistinbûna hevbeş a jinan, bi bingehîn hate guhertin. Giranî dide rêxistinkirin, perwerde û bihêzkirina jin tekoşîna ji bo



wekhevî û azadiya jin, di hemû qadên jiyanê hatiye avakirin.

### Kongra Star di tevaiya qadan de bû pêşeng

Kongra Star, di sala 2005'an de bi navê Yekitiya Star ji hêla jinên piraniya wan Kurd bûn, hate damezrandin û ji ber rejîma Baas, veşartî dixebitîn. Salên destpêkê ji bo jinên di nav rêxistinê de cîh girtin, dijwar û xeternak bûn. Çalakvan, bûne hedefa rejima Sûriyê, hatin girtin û êşkence li wan hat kirin. Herwiha, rêxistinkirina gel ji hêla endamên Yekitiya Star di dema rejîma Baas de hat meşandin û bû bingehek giring di dema destpêkirina krîza Sûriyê de.

Dema ku di 19'ê Tîrmeha 2012'an de li Rojava şoreş dest pê kir, tevgera jinan rola pêşeng lîst. Li hemberî hemû şêweyên êriş û zextên baviksalarî derdikeftin û li dijî siyastên mêtînger, asîmîlasyon, qirker û kapîtalîst şer kir. wê demê Kongra Star, hemû destkeftiyên jina parast û di tekoşîna li hemberî DAIŞ'ê de pêşengtî kir û YPJ jî wek hêza parastina jin, hat pejirandin. Bi vê awayî parsatina hevjiyana azad û beşdariya demokratîk bi nûnertiyên etnîkî û olî re, di jiyana civakî, siyasî û çandî de dike. Herwiha ji roja yekemîn a şoreşê û vir ve, rolek sereke leyîst û bû yek ji tevgerên siyasî yên pêşeng li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê. Ew wek tevgerek ji bo piranî jinên Kurd dest pê kir, lê mezin bû û ji her qewm û olê jin girtin nav xwe.

### Bi jinên Kurd destpêkir, mezin bû û bû hêviyajinên cîhanê

Di sala 2016'an de, Yekitiya Star navê xwe guhert û kir Kongra Star. Ji bo hemû saziyên jinan ên ku di bin peymanek de bixebitin li hev kiribûn, Bû saziyek sîwanî. Dema herêmên piraniya wan Ereb ên wek Minbic, Tebqa, Reqa û Dêra Zorê, ji DAIŞ'ê hatin rizgarkirin û wan jî di projeya Reveberiya Xweser de cih girtin. Jinên Ereb dîtin ku wekheviya wan yaji hemû aliyan ve heye û li her cihî jin bi heman zahmetiyan re rû bi rû dimîne, wan jî rêxistina xwe di konferansa sala 2021'an de, bi navê Meclisa Jinan a 'Zenobia' ava kirin. Meclisa Zeonbia li herêmên ku piraniya wan ji gelê Ereb pêk tê, xwe li ser sîstema Kongra Star dimeşînin.

Avanî û komîteyên Kongra Star Kongra Star ji komîn, meclîs, akademî, kooperatîf û komîteyan pêk tê. Konferansên xwe her 2 salan carekê li dar dixe. Ji hemû qadên xebatê, rêxistin, kom û komîteyan ku Kongra Star jê pêk tê, tevlîdibin û xebatên xwe yên du salan dinirxînin û ji bo pêşerojê biryaran didin. Li wir jî endamên komîteyê û koordînasyona Kongra Star têne hilbijartin.

Ji bo pêkanîna armancên xwe, 12 komîteyên Kongra Star hene ku li ser beşên cuda yên xebatê disekinin. Di hemû komîteyan de, kar û projeyên xweser têne pêşxistin.

### Komîteyên Kongra Star jî wiha ne:

Komîteya Perwerde û Akademiyan, Komîteya Cikavî, Komîteya Siyasî, Komîteya Têkelî û Tifaqên Demokratik, Komîteya Parastina Cewherî, Komîteya Hiquq û Dadê, Komîteya Aboriya Komunal, Komîteya Darayî, Komîteya Çand û Hûner, Komîteya Ragihandinê, Komîteya Tenderûstî, Komîteya Ekolojîk.

### Karê Kongra Star di pêşxistina aboriya jin de

Kongra Star di her milî de pêşengiya civakê dike, jin bi pêşengiya Kongreya Star tevlî nava karên aboriyê bûn. Kongreya Star ji bo karên aboriyê yên giştî bi rengekî demokratîk û di çarçoveya azadiya jinê de ku bêne meşandin, xwe xwedî rolê herî mezin e. Her wiha sala 2015'an Komîteya Aboriyê ya Jinê ava kir û bi vî rengî sîstema aboriya xweser a jinê bi rêxistin kir. Heta niha jî karê xwe bênavber dewam dike. Komîteya Aboriyê ya Jinê tevî hemû kanton û navçeyên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, li Şehba û taxa Şêxmeqsûd a Helebê jî xwe bi rengê komîteyên jêrîn bi rêxistin kiriye û jinan tevlî nava aboriyê dike. Ji bo avakirina qadên kar, şêwirmendiyê dike û qadên hilberînê diafirîne. Komîteya Aboriya Jinê bi giranî pêşengiyê ji rêxistiniya jinan a bi rengê kooperatîfan dike. Niha li tevahiya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê qadeke ji 60 hezar donim zevî bi kar tîne, diçîne. 30 hezar donim jê pêşkêşî kooperatîfên çandiniyê yên jinan hatiye kirin. Heleb û Şehba jî, di nav de li qadên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê 60 kooperatîfên jinan ên Komîteya Aboriyê ya Jinê ya Kongreya Star hene. Ji kooperatîfên di çarçoveya Komîteya Aboriyê ya Jinê de hatine avakirin 30 jê di karên konserwe, firin, sewalkarî û xizmetê de dixebiti û hrwd.

### Armancên bingehîn

Kongra Star tekoşîna li dijî ferasetên baviksalarî, zayendperestî di hemî warên jiyanê û demokratîkkirina malbatê û guhertina zilam li ser esasê wekheviyê, dide meşandin. Ji bo xurtkirina jiyana hevbeş a demokratîk û aştiyane ya komên etnîkî û olî yên cuda, li Rojava û Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi têkoşîna li dijî îdeolojiyên wekî neteweperestî û şovenîzmê, kar dike.

Li hember qirkirina çandî parastin û zindîkirina çandan, têdikoşe. Herwiha ji bo tekoşîna hemberî hemû şêweyên şîdeta zayendî bi xurtkirina xweparastina jinan, bilindkirina hişmendî û mekanîzmayên dadmendiya civakî, kar û xebatê dike. Ji bo parastin û pêşxistina mafên zarokan, herwiha parastina xweza bi avakirina hişmendiya hawîrdora civakî ya li dijî hemû kiryarên wêrankar, dixebite. Herwiha ji armancên sereke yên kar û xebatên Kongra Star yek jî, xurtkirina beşdarbûna jinan di jiyana aborî de, taybet bi pêşxistina projeyên aborî yên xweser de ye.



**Ne tesadufe rapor û gefên êrişan bi hev re hatin rojevkirin**

**Dilyar Cizîrî**

Dewleta Tirk careke din gefa êrişên dagirkiriyê, li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dixwe. Fermandarê QSD'ê Mazlûm Ebdê derbarê gefan de bersiva pirsên Rojnameya El-Menîtor a Amarîkî da û diyar kir ku bi nêzîkbûna hilbijartinên li Tirkiyê re ihtîmala êrişên nû heye. Ew jî bi cidiyet nêzî vê mijarê dibin û destnîşan kir ku ew ê ji bo parastina herêmê her tiştî bikin. Ji xwe her dem ev helwesta QSD'ê û fermandariya zelal e.

Lê ya ne zelal û hemwextî nûkirina gefa êrişeke bejahî ya li dijî herêmê û hin raporên bi hev re di bin navê "binpêkirinên mafan" de, werin weşandin. Di nerîna min de ne tesadife ku rapora "Toreya Rojnamevanên Kurdên Sûriyê" di bin navê binpêkirinên li dijî rojnamevanan de û rapora rêxistina Human Rights Watch ya sala 2022'an ya di beşê xwe yê li ser Sûriyayê de diyar kiri; herwiha îdayên girtina rojnamevanan û îdayên sûcên li dijî mafê mirovan li yên li herêmên Rêveberiya Xweser, bi zimanekî kirêt werin rêzkirin.

Tiştê van xalan baş zelal dike jî, yekser hin malper û saziyên ragihandinê agahî ji rapora Toreya Rojnamevanên Kurd derxistin û ji bo reşkirina Rêveberiya Xweser û QSD'ê bikar anîn. Di wir de jî sûcên dewleta Tirk, wekî QSD'ê kiriye nîşan didin.

Di heman demê de rapora Human Rights Watch ku agahiyên xwe naspêrin çavkaniyên fermî yên herêmê, berûvajî wê dispêre alîgirên Tirkiyê. Tevî tê zanîn, saziyên fermî di hemû aliyan de li herêmê hene Human Rights Watch, bê ku berê xwe bide wan îddea û agahiyên ji rastiyê dûr, li ser zimanê alîgirên Tirkiyê di rapora xwe de bi cih kirin e

Ji ber wê jî divê gelê me û her kesekî dilê wî ji bo ewlehî û aramiya herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê lêdide, hişyar be. Planek dijberiya herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê di xizmeta dewleta Tirk a dagirker de heye. Dibe hin kes pirsa çawa di xizmeta dewleta Tirk de ye, bikin. Em jî wan re dibêjin: hemwextî êrîşan reşkirina Rêveberiya Xweser û QSD'ê wê di xizmeta kê de bin gelo? Bersiv jî ew ku bi van raporan dixwazin bingehê êrişek nû ava bikin e. Bi taybet ev demeke her gefên Erdogan ên êrîşkirina li dijî herêmê rastî ne razîbûna aliyan tê. Ji ber wê jî vê carê bi van raporên reşkirinê zemînê ava dikin û rojevan li gorî berjewendiyê xwe çêdikin.

Tişta zêde mirov dêşîne jî, hin kesên em nas dikin niha li herêmê nasnameya rojnamevaniyê wergirtine û bi saya QSD'ê û Rêveberiya Xweser, dikarin rehet pîşeya rojnemaveniyê bikin, lê cihê xwe di van rapor û îdayên reşkirinê de digirin. Di vir de armanca min ne ewe ku ez bêjim kêmasî nînin û di herêmê de her tişt çar çare, lê gotina min ji her kesî re destê xwe dîne ser wijdanê xwe. Divê tu kes li pey xizmetkarên dijmin nekevin, ji ber ev qonaxa man û namana me ye.



# Koçberên Efrînê : Topên dijmin nikarin têkoşîna me bidin sekinandin

Bi nêzîkbûna salvegera 5'an ya dagirkirina Efrînê, koçberên Efrînê dan zanîn ku dagirkeriya Tirkiyê kêliyekî jî di hovîtiya xwe de gav paş de neavêtiye û wan jî, kêliyekî dest ji berxwedaniyê berneda ye.

**Zana Roj/ Şehba**

Piştî dagirkirina herêma Efrînê hovîtiya dagirkeriya dewleta Tirkiyê li ser gelê Efrînê, tu carî nehat rewastandin. Bi tavahî cureyên taknîk û çekên qedexekirî, dewleta tirk êrişên xwe yên li ser gelê kurd û hêzên tekoşîna azadiya gel didomine. Ev 5 salin bê navber êrişên dewleta dagirker li ser koçberên ku wan ji cih û warê wan kirin didimon û herwiha dorpêç û amborgoya rêjima Şamê jî li ser van koçberan didomin. Lê gelê berxwedêr li hember hemû êriş û zehmetiyan di tekoşîna xwe ya azadiyê de pêngav paşde ne avêtiye û bi israr in ku vê tekoşînê bigîhînin serkeftinê.



Girêdayî dewamkirina êrîşên dagirkeriyê yên li ser herêmê û ambargoya rejîma Şamê hemwelatiyên Efrînê yên bi navê Qaziqlî Mihemed Silêman û Îlfet Elî Berko ji rojnameya me re axivîn.

### "Armanca dagirkeriyê valakirina herêmê ye"

Qaziqli di axaftina xwe de anî ziman ku êrîşên dagirkeriya Tirkiyê li ser gelê koçber kêliyekî nehatiya rawestandin û wiha got: "piştî derketina me ji bajarê Efrînê di dîroka 16 adara 2018'an de û bicihkirina me li herêma Şehba yê, dagirkeriya Tirkiyê, li herêma Şehbayê jî kiryarên xwe yên qirkirina kurdan domandin. Bi dehan komkujî, li herêmê pêkanîn û heyanî roja îro jî topbaranên dagirkeriyê bi riya obîs, balafirên bê mirov û tangan berdewam dikin û armanca van êrîşên ewe ku herêma Şehbayê jî vala bike û bigihêje xeyalên xwe yên dagirkirina Sûriyê giştî."

### "Ne têkoşîna gel hatiye rawestandin û ne jî topbaran a dijmin"

Qaziqli di gotinên xwe de tekez kir ku hebûna gel li herêmê, ji bo dagrkeriyê misogerkirina vegera Efrînê ye û wiha domand: "Hebûna gelê Efrînê li herêma Şehbayê û berxwedaniya ku tê kirin, ne tiştekî ji rêzê ye. Rûxmê siyasetên kuştin û talankirina ku ji aliyê dijmin ve tê meşandin, her wiha polîtîkaya dorpêçê ya ku ji aliyê Hikumeta Şamê ve hatiye ferz kirin, pir bi dijwarî didome jî, lê gelê ku li herêmê jiyan dike kêliyekî jî nafikirin ku dev ji berxwedaniyê berdin. Lewra hebûna gelê Efrînê li Şehbayê, ji bo dagirkeriyê tê wateya misogerkirina vegera Efrînê. Lewma mirovdikare bêje li Şehba konaxa berxwedanê ya duyem e û vêcarê gel bi israre ku heya nevegere ser xaka xwe, ew dest ji jiyana xwe ya berxwedanê bernadin."






### "Bi nêzîkbûna salvegera 5'an ya dagirkeriya xwe, dixwazin xwe mayînde bikin"

Îlfet Elî Berko jî di axaftina xwe de da xuya kirin ku di salvegera 5'an ya dagirkirina Efrînê de, ji her milî ve daxwaza têkbirina îradeya gel dikin û wiha domand: "Di van demên dawiyê de faşîzma dewleta Tirk, bi hemû hêza xwe êrîşî herêmê dike. Di encama van êrîşan de gelek zirarên madî çê bûn û windahî hatin dayîn. Lihevkirina bi Şamê û hêzên derve re, dijmin dixwaze bi têkbirina îradeya gelê herêmê, careke din bi êrîşên xwe hebûna xwe mayînde bike."

### "10 sal din jî be, em nahêlin ku dijmin bigihe armanca xwe"

Îlfet di dawiya axaftina xwe de anî ziman ku deh sal jî derbas bibin wê nehêlin dijmin bigihe, armancên xwe û wiha domand: "Têkoşîn û berxwedaniya ku li herêma Şehbayê tê kirin hemû li ser bingeha valaderxistina dagirkeriya Tirkiyê û hikumeta Şamê ye. Ger deh sal din jî em li herêma Şehbayê de di çadiran de bimînin, emê nehêlin dijminê me yê sedsalan, xwe bigihîne armanca xwe. Herwiha zindîkirina berxwdaniyê û bi rêvebirina vê têkoşînê erka me û zarokên me ye."

## Gelên Sûriyê di nav zehmetiyên mezinde ne



**Zekî BEDRAN**

Gelek dewlet li qada listokan cih digire. Taybet Rûsya ji bo ku rêveberiya Şam`ê li ser piyan bigre û ji bo welat bi gîştî bixe bin desthilatdariya wî, kar dike. Tirkiyê jî, hewl dide ku Îdlîb jî di nav de herêmên dagirkiriye bi giştî bixe bin desthiladariya Îxwanciyan û rêxistinên weke El Nusra de. Herwiha heta niha dixwast rêveberiya Şam`ê tasfiye bike û van hêzan bîne ser desthilatdariyê. Bi destê vana jî ewê Sûriyê bixista bin kontrola xwe. Di nav senaryoyên dagirkerî û xerabiyande ya sereke jî domandina planên qirkirina Kurdan hebû.

Îran rêyek ê ji Rûsya cûdatir dişopîne. Hedefa wê ya esasî jî rêveberiya Şam`ê li ser piyan girtin û rêxistinên îxwancî bê bandor kirin e. Her wiha Tirkiyê, di asta Rojhilata Navîn de xwe ji bo pêşengtiyê eniya sûnnî amade dikir. Lewma Îran, dijberê hêz û serweriya Tirkiyê ya li Sûriyê ye. Heman demê demokratîkbûn û pêşketina reforman ya li Sûriyê ji bo Îran'ê ne xeme û li ser esasê ol ê xwe di nava gel de jî rêxistin dike.

Walatên DYA û Ewropa jî, diyar dikin ku hebûnên wan ya li Suriyî bi şerê DAİŞ'ê sînordar e û dibêjin; şîrîkatiya me ya bi QSD re taktîkî, leşkerî û demkî ye. Tirkiyê bi taybet DYA'yê, bi destekdayîna YPG û PKK sûcdar dike! Ew jî xwe ji xwedîderketin û destekdayîna rêveberîyê xweser, dûr digre. Dizanin ku Kurd di bin dorpêç û xeteriya qirkirinê de ne, lê cardin jî hevkariyê xwe bi Tirkiyê re didomînin. Şopandina xeta demokratîk ya Kurdan, nayê hesabên wan. Di dagîrkirina hinek herêman de rêveberiya Trump bû hevkarê sucê wan.

Di rewşa heyîde Sûriyê bi 3 beşan tê rêvebirin. Beşek di bin desthilatdariya Şam`ê de ye. Beşek herêmên ji DAİŞ hatine rizgarkirin û beşa din jî herêma ku artêşa Tirkan dagirkirine û weke Idlib xistine bin parastina xwe ye. Di nava van rêveberiyan de ya demokratîk û gel bixwe xwe bi rêve dibe, tenê herêma bakûr û rojhilatê Sûriyê ye. Di van herêmande hemû pêkhateyên qewmî, olî û çandî di nav aştiyê de wekhev û azad jiyan dikin. Bi taybetî di nava civakêde pêşengtiya jinê di diroka Rojhilata Navîn de gûhertina herî kûr û bingehîn ya dîrokî çêkir.

Hêzên heyî û xwe bicîhkirina wan bi kûrtasî me behs kir. Ger bi baldarî lê binerin lêgerinekê, DYA , Rûsya, rêveberiya Şam`ê û Tirkiyê, ya pêşxistina demokrasi û azadiyê nîne. Gelê Sûriyê di nav xizanî û zehmetiyên pir mezin de jiyan dike. Dewletên heyî her tim di nava hevdîtinên bazar û pevçunên berjewendiyên xwe de ne. Lê ji bo çawabûna rewşa gelê Sûriyê, dermankirina birînên wê, tu kes tiştek nake. Gotinên ku li pêşiya ragihandinê tên gotin jî, tenê propaganda û xwe ji reqna xelaskirinê ne. Desteka herî mezin ya ewlekariya cîhanê li Suriyê QSD û herêmên xweser kir. Heta niha jî bi deh hezaran girtiyên DAİŞ`ê di bin kontrola wan de ye.

Vekirina deriyê Til Koçer Rusya bi israr asteng dike. Alîkariyên ji derve tên tenê di deriyê sînurê Tirkiyê de dikarin derbasî hindirê Sûriye bin. Leyma herêmên xweser ji alîkariyan bê par tê hiştin. Rûsya teybet kar dike ku herêmên xweser lawaz bikevin û radestî rêjîmê, bibin. Ji xwe li qada siyasî jî herêmên xweser ji derveyî hemû hevdîtin û nîqaşên çareseriyê hatiye hêştin. Rûsya, li gor nerînên rêveberiya faşîst ya Tirkiyê, tevdigere. DYA jî di heman rewşê de ye. Herêmên xweser tevlî Licneya Destûr ya Cinêv jî nekir in. Çeteyên girêdayî Tirkiyê jî di bin nave mixalefetê birin wir, lê Kurd û nûnerên bi milyonan yên gelê bakûr û rojhilatê Sûriyê, li derve hatin hiştin.

Rewşa gel ê di bin rêveberiya Şam`ê de, gelek xirab e. Hilweşandinek abori ya mezin heye. Dolar bilind dibe, pere yê Sûriyê nirxê xwe winda kir û dike. Gel her ku diçe xizan dibe. Maaşê wan di asta tûnebûnêde ye. Nirxê her tiştî her roj bilind dibe. Hêza kirînê ya gel nema ye. Di wateya siyasîde gaveke ku hêvî bide gel, nîne. Tu kes nikare rêveberiya heyî rexne bike û daxwazên xwe jî bi lêv bike. Kurtasî gel hatiye fetisandin.

Herêmên di bin dagirkeriya Tirkiyê de rewş hin xirabtir e. Çete talan, dizî, tecawûz, îşkence û hemû xirabiyan dikin. Dewleta Tirkan li herêmê, hember Kurdan qirkirina qewmî pêk tîne û wan çeteyan berdide ser gel. Li Îdlîb`ê hêzên weke El Nusra pergaleke weke ya DAİŞ`ê avakirin e. Gel nikare nefes bigre, kanûna zordariyê û çekan, derbasdar e.

Di van herêman de xizaniyek mezin heye. Dewleta Tirkan di van herêman de tenê ji bo berjewendiyên xwe kar dike. Ji aliyê aborî, Siyasî û civakî de herêmên herî baş û li pêş in, herêmên xweser yên bakûr û rojhilatê Sûriyê ne. Şûna ku piştgirî bidin van herêman û ji bo herêmên din bikin mînak, dixwazin bifetisînin û ji holê rakin. Lewma gelên Sûriyê, divê êdî qedera xwe bigrin destê xwe bixwe. Bi dewletên heyî re pirsgirêk çareser nabin. Herwiha hêzên demokratik yên cîhanê jî, divê li rêveberiya xweser û destkeftiyên wê xwedî derkevin û şebekeyek navnetewî ava bikin.